# Daxwaza we ya penahxwaziyê

Zanyariyên ser Rêbaza Giştî ya Penahxwaziyê

**Çima we ev nivîsoka wergirtiye?**
Hûn hez dikin daxwaza penahxwaziyê li Holandayê bikin. Penahxwazî yanê parastina li welatekî din bo kesên ku li welatê xwe ewle nînin û nikarin li wir werin parastin.

Wexta hûn daxwaza penahxwaziyê dikin, hûn bi fermî ji dewleta Holandayê daxwaza destûra mayînê dikin. Bo jiyana li Holandayê pêdiviya we bi vê destûrê heye. Rêbaza penahxwaziyê hema ku hûn daxwaza penahxwaziyê bidin dest pê dibe. Rêbaza penahxwaziyê rêbazeke qanûnî ye ku dewletaHolandayê tê de diyar dike hûn dikarin destûra mayînê wergirin yan na.

Ev nivîsoka gavên bo rêbaza penahxwaziyê şirove dike. Herwiha şirove dike hûn divê çi bikin (erkên we) û hûn dikarin ji dewleta Holandayê bendewarî çi bin (mafên we).

# Hûn dê rastî kîjan saziyê werin?

Saziya **Centraal Orgaan opvang asielzoekers** (COA) li Holandayê li wexta rêbaza we ya penahxwaziyê berpirsa wergirtin û piştevaniya penahxwazan e. COA piştrast dibe xwarin û sîgorteya we ya tenduristiyê heye û dikare, eger pêwîst be, bo we ji bijîşkan re telefon bike. COA saziyeke serbixweye û ser daxwaza we ya penahxwaziyê biryar nade.
www.coa.nl

**GezondheidsZorg Asielzoekers** (GZA) eger hûn nexweş bin yan pirsên we yên bijîşkiyê hebin arîkariyê bo we dabîn dike. Navendeke GZA ya tenduristiyê nêzîkî yan li her cihekî wergirtinê ya COA heye. GZA dikare bo we li bal bijîşkê arîkar, perestar, karkerê piştevaniya pratîk yê GGZ yan bijîşkê giştî hevdîtinan pêk bîne.
www.gzasielzoekers.nl

**VluchtelingenWerk Nederland** (VWN) saziyeke serbixwe ya mafên mirov e ku berjewendiyên penahxwazan bi pêş dixe. VWN dê ser rêbaza penahxwaziyê zanyaaariyan dabîn bike, li hemû rêbaza penahxwaziyê we agahdar û piştevaniya we bike, û di pirsgirêkên bi saziyan re navbeynkariyê bike. Ew ser vê pirsê ji nêzîk ve bi parêzerê we re kar dikin. VWN ser daxwaza we ya penahxwaziyê biryar nade.
www.vluchtelingenwerk.nl
www.forrefugees.nl

The **Raad voor Rechtsbijstand** (RvR) piştrast dibe eger hûn nikarin bixwe debara xwe bikin ji parêzerekî arîkariyê werdigirin. RvR dê diravê xizmetên parêzer dike bide. Parêzer bo RvR kar nake.
Parêzer pêkhînerê qanûnî yê serbixweye ku li wexta rêbaza penahxwaziyê arîkariya we dike.
www.rvr.org

Beşa **Immigratie- en Naturalisatiedienst** (IND) beşeke Wezareta Dadwerî û Ewlehiyê ya Holandayê ye. Karmendên IND dê lêkolîn bikin hûn dikarin li Holandayê penahxwaziyê wergirin yan na. Ew dê bo vê mebestê ji we bipirsin hûn kî ne û çima daxwaz penahxwaziyê li Holandayê dikin. Ew dê ser çîrok û rewşa we li welatê jê hatine lêkolîn bikin û biryar bidin hûn dikarin bi awayê demkî yan herdemî li Holandayê bimînin yan na.
www.ind.nl

Ew li avahiyên IND û navendên wergirtinê yên COA de **parêzvanên ewlehiyê** in. Hûn dikarin ji cilên wan ve wan nas bikin. Ew bo ewlehiya we li wir in. Hûn dikarin ser destûra çi li avahiyên IND û COA heye û çi tuneye bipirsin. Parêzvanên ewlehiyê bandora wan ser biryara daxwaza we ya penahxwaziyê tuneye.

Saziya **Internationale Organisatie voor Migratie** (IOM) serbixwe ye ku li seranserê dinyayê piştevaniya penahxwazan dike. Eger hûn bi awayê serbixwe bixwazin ji Holandayê biçin, IOM dikare arîkariyê bide we. IOM ser vegerîn û dîsan tevlêbûna we zanyariyên pratîk dide û dikare di amadekirina çûyîna we ji Holandayê arîkar be. Bo vê arîkariyê ji karmendê VWN yan parêzerê xwe bipirsin.
www.iom-nederland.nl

Saziya **Dienst Terugkeer en Vertrek** (DT&V) beşeke Wezareta Dadwerî û Ewlehiyê ya Holandayê ye. Eger IND penahxwaziya we red bike. DT&V dê arîkar be vegerin welatê xwe.
www.dienstterugkeerenvertrek.nl

Saziya **Dienst Justitiële Inrichtingen** (DJI) beşeke Wezareta Dadwerî û Ewlehiyê ya Holandayê ye. Wexta hûn li binçavgeha koçberiyê de hûn li cihekî ewle de dimînin. DJI avahiyê bi rê ve dibe. Karmendên DJI cilên taybet li xwe dikin. Ew dê li wexta mayîna we li avahiya ewle de muqate bin û arîkariyê bikin.
www.dji.nl

## Bendewar in hûn çi bikin?

Girîng e bizanin gotinên we li wexta rêbazê de piştevaniya sebebên daxwaza we ya penahxwaziyê dikin. Herwiha bendewarî heye hûn her belgeyaheyî yan dikarin wergirin (wekî belgeyên xwe yan nameyên piştevaniya gotinên xwe) nîşanî INDbidin.

Beriya hevpeyvîna we ya daxwazê, we nivîsokek ser şandina belgeyan ji IND wergirt. Ew nivîsok şirove dike çawan belgeyên têkildarî daxwaza xwe ya penahxwaziyê piştî tomarbûnê bişînin IND.

Eger her rewşa we yaferdîhebe ku divê were raçavkirin IND agahdar bikin. Wê demê IND dikare li wexta hevpeyvînê yan qebûlbûna we li COA her kiryarê pêwîst û guncaw bike. IND dê heya mimkin piştevaniya we bike.

## Amadebûna bo rêbaza we ya penahxwaziyê

Li wexta Serdema Bêhnvedan û Amadebûnê de (Rust- en Voorbereidingstermijn, RVT), hûn dê li navendeke COA bijîn.

Hûn dê liwexta RVT bikevin ber lênêrîna bijîşkiyê diyar bibe hûn dikarin sebebên daxwaza penahxwaziyê ji me re bibêjin yan na. Li wexta RVT, karmendekî VluchtelingenWerk (VWN) j dê ser rêbaza penahxwaziyê zanyariyan dabîn bike. VWN li wexta rêbaza penahxwaziyê arîkarî û piştevaniyê dabîn dike. Ev arîkarî belaş e. Hûn dê demeke kin beriya destpêbûna rêbaza xwe ya penahxwaziyê parêzerê xwe bibînin.

Parêzerê we qanûn û rêzikên ser penhaxwaziyl dizane, û dê arîkar be hûn xwe bo hevpeyvîna bi hûrgilî amade bikin. Ev hevpeyvîna bi IND re ye we tê de gotiye çima daxwaza penahxwaziyê dikin. Arîkariya parêzerê we belaş e.

Eger zarokên we yên 15 salî û jortir hebin, hevpeyvîna wan dê cuda û bi hûrgilî be. Egerzarokên we yên 12–15 salî hebin ku sebebên wan bixwe bo daxwaza penahxwaziyê hene, ew dikarin eger hez bikin bi IND re hevpeyvîna xwe ya bi hûrgilî bikin. Hûn dikarin parêzerê xwe ji vêya agahdar bikin.

## Rêbazapenahxwaziyê, roj bi roj

Li roja hevdîtina we digel IND, divê hûn biçin nivîsgeha IND. Ev wê hingê ye Rêbaza Giştî ya Penahxwaziyê (Algemene Asielprocedure, AA) dest pê dibe. AA bi gelemperî 6 rojan dikişîne. Rêbazeke Giştî ya Penahxwaziyê jî heye ku dirêjtir e: AA+, ku bi gelemperî 9 rojan dikişîne. AA+ bo armanca wan daxwazên penahxwaziyê ye ku pêdiviya bi lêkolîna zêde ya IND heye, û penahxwaz jî ji ber pirsgirêkên mêjî û bedenî pêdiviya wan bi baldariyapirtir hene. Piştî RVT, IND dê biryar bide hûn rêbaza AA bişopînin yan AA+.

Hûn divê li wexta rêbaza penahxwaziyê li heman navenda wergirtinê bimînin ku li dema amadebûna rêbazê lê diman. Hin caran, renge we piştî serdema bêhnvedan û amadebûnê bibin cihekî nêzîktirî nivîsgeha IND. Ew dê bo hevpeyvînên IND we bibin nivîsgeha IND meger ewqasî nêzîk be ku bi pêyan biçin. Tiştên jêrê wesifandina rêbaza we ya penahxwaziyê ser bingeha roj-bi-roj in.

*Rêbaza Giştî ya Penahxwaziyê (AA)*

**Roja 1: hevpeyvîna bi hûrgilî**
Hevpeyvîna bi hûrgilî hevdîtina bi karmendekî IND ye. Hûn li wexta hevpeyvînê de şiroveyên bi hûrgilî ser sebebên daxwaza xwe ya penahxwaziyê didin. Karmendê IND dê li wexta hevpeyvînê pirsan jî ji we bike. Eger hûn hez bikin, dikarin ji VWN daxwaz bikin beşdarî hevpeyvîna we ya bi hûrgilî be. Hûn dikarin vêya bi rêya parêzerê xwe jî pêk bînin.

Wergêrekî devkî dê beşdarî hevpeyvînê bibe. Karmendê IND dê bi zimanê Holandî pirsan bike. Wergêrê devkî pirsan bi zimanê hûn fêm dikin wergerîne û bersivên we li Holandiyê wergerîne. Wergêrê devkî serbixwe ye, bo IND kar nake û ser biryara têkildarî daxwazaweya penahxwaziyê bandora wî tuneye. Ji kerema xwe bizanin: eger hûn û wergêrê devkî bo fêmkirinê pirsgirêka we hebe, girîng e hema rasterast bibêjin. Eger wisan be, IND dê hewl bide wergêrekî devkî yê din peyda bike. Girîng e şaş fêmkirina ji ber şaşfêmkirina pirsan çênebe. Karmendên IND dê ji hevpeyvîna bi hûrgilî raporekê amade bikin.
Eger hûn û hevjîna we bi hev re daxwaza penahxwaziyê bikin, hûn dê hevpeyvînên cuda bi IND re bikin.

Girîng e hûn hemû wan rastiyan bibêjin ku biselimîne pêdiviyawe bi parastinê heye. Ser her çi rû daye û çima nikarin li welatê xwe werin parastin rast, tam û zelal bin. Eger hûn nikarin rûdaneke taybet bi bîr bînin, ji karmendê IND re bibêjin. Ew ji rewşa giştî li welatê we agahdar in. Girîng e hûn rewşa xwe şirovebikin: çima pêdiviya we

bixwe bi parastinê heye? Heya mimkin e hûrgiliyên têkildar bibêjin. Eger kêşeyên we yên bedenî yan mêjî têkildarî sebeba daxwaza penahxwaziyê hebin, girîng e ji karmendê IND re bibêjin. Eger IND lênêrîna bijîşkiyê bo nirxandina daxwaza we mifadar bibîne, wê demê biryar bide vêya bo we bike. Herwiha hûn dikarin bi xercê xwe jî lênêrîna bijîşkî bikin.
Wergêrekî devkî jî dê li lênêrînê hebe. IND yan parêzer dê rapora hevpeyvîna bi hûrgilî bide we.

**Roja 2: nîqaşa hevpeyvîna bi hûrgilî**
Parêzerê we dê ser rapora hevpeyvîna bi hûrgilî bi we re nîqaş bike. Wergêrekî devkî jî dê li wir be û gotina we û parêzerî wergerîne. Eger tiştek di raporê de ketibe yan rast nehatibe nivîsîn, parêzerê we dê binameyekê vêya ji IND re bibêje.

**Roja 3: biryara destpêkê**
IND dê binirxîne ka mercên we yên destûra rûniştina penahxwaziyê heye yan na. Encama vê nirxandinê pêvajoya pirtir ya rêbaza penahxwaziya we diyar dike. 3 imkan hene:
1. Mercên we bo destûra mayîna penahxwaziyê hene. Hûn dê nameyeke biryarê (bi rêya parêzerê xwe) ji IND wergirin ku dibêje daxwaza we ya penahxwaziyê hatiye qebûlkirin. Hûn dikarin bi awayê herdemî yan demkî jiyana li Holandayê bidomînin. Parêzerê we dê bibêje ev çawan ser we bandorê datîne.
2. Pêdiviya IND bi wextê pirtir heye lêkolînê bike û nikare di nava 6 rojan de (yan 9 rojan bo AA+) biryar bide. IND dê li Rêbaza Dirêj ya Penahxwaziyê (VA) daxwaza we ya penahxwaziyê vebinêre. Biryara ser daxwaza we ya penahxwaziyê dê piştre were. Hûn dê nivîsokeke din bi zanyariyên ser Rêbaza Dirêj ya Penahxwaziyê wergirin.
3. IND diyar dike mercên we bo destûra mayîna penahxwaziyê tuneye. Hûn dê nameyeke (bi rêya parêzerê xwe) ji IND wergirin ku dibêje IND dil heye daxwaza we ya penahxwaziyê red bike. Ji vê re mebestname dibêjin. Name dê bibêje jî sebebên redbûn û dûhatên wê bo we çi ne. Parêzerê we dê ser nameyê bi we re nîqaş bike.

**Roja 4: bersiva biryarê**
Eger IND dil hebe daxwaza we ya penahxwaziyê redbike, hûn dê ser mijarê bi parêzerê xwe re biaxivin. Parêzerê we dikare bersiveke nivîskî ji IND re bişîne ku tê de hûn dikarin bi fermî bersiva mebestnameya IND bidin û bibêjin çima hûn qebûl nakin.

**Rojên 5 û 6: biryar**
IND dê piştî xwendina bersiva we binirxîne ka mebesta wê diguhere yan na. Encama vê nirxandinê pêvajoya pirtir ya rêbaza penahxwaziya we diyar dike. Hûn dê nameyeke (bi rêya parêzerê xwe) ji IND wergirin ku encama nirxandinê rapor dike. Parêzerê we dê bibêje ev çawan ser we bandorê datîne. 3 imkan hene:
1. IND piştî xwendina bersivawe bi bawer e mercên we bo destûra mayîna penahxwaziyê heye. Hûn dê nameyeke biryarê (bi rêya parêzerê xwe) ji IND wergirin ku dibêje daxwaza we ya penahxwaziyê hatiye qebûlkirin. Hûn dikarin bi awayê herdemî yan demkî jiyana li Holandayê bidomînin. Parêzerê we dê bibêje ev çawan ser we bandorê datîne.
2. Pêdiviya IND bi wextê pirtir heye lêkolînê bike û nikare di nava 6 rojan de (yan 9 rojan bo AA+) biryar bide. IND dê li VA daxwaza we ya penahxwaziyê vebinêre. Hûn dê nivîsokeke din bi zanyariyên ser Rêbaza Dirêj ya Penahxwaziyê wergirin.
3. IND diyar dike mercên we bo destûra mayîna penahxwaziyê tuneye. Hûn dê nameyeke biryarê (bi rêya parêzerê xwe) ji IND wergirin ku dibêje daxwaza we ya penahxwaziyê hatiye redkirin. Name dê sebeb û dûhatên redbûnê î bo we bibêje. Wek mînak, renge êdî hûn nikaribin li Holandayê bimînin û bijareyên vegerîna

welatê we diyar bike. Name herwihadibêje eger hûn biryarê qebûl nekin çi bikin û bijareyên vegerîna welatê we diyar bike. Parêzerê we dê ser nameyê bi we re nîqaş bike.

*Rêbaza Giştî ya Penahxwaziyê 9 rojan (AA+)*

Eger IND daxwaza we yapenahxwaziyê li AA+ binirxîne, rêbaza we ya penahxwaziyê dê bi gelemperî 9 rojan bikişîne:
- Rojên 1 û 2: hevpeyvîna bi hûrgilî;
- Rojên 3 û 4: nîqaşa hevpeyvîna bi hûrgilî digel parêzerî;
- Roja 5: biryara destpêkê
- Rojên 6 û 7: berteka hemberî biryarê (bersiva) bi rêya parêzerî
- Rojên 8 û 9: biryara duyem

## Paşvegerandina daxwaza xwe

Hûn dikarin her wextê daxwaza xwe paş vegerînin. Wê demê, em tewsiye dikin bi parêzerî re yan jî rasterast bi IND re pêwendiyê çêbikin. Eger hûn ji IND daxwaza xwe ya penahxwaziyê paş vegerînin, hûn êdî nikarin li Holandayê bimînin, meger ku bi sebebeke din destûrê bidin we li vir bin. Hûn êdî penaber jî nabin. Eger hûn daxwaza xwe ya penahxwaziyê paş vegerînin, renge hûn bikevin ber qedexeya hatina nava vî welatî jî. Ev yanê hûn nikarin sefera Holandayê û gelek welatên din yên Ewropayê bikin yan lê bin. Hûn dikarin piştî paşvegerandina daxwaza penahxwaziyê, eger bikevin ber qedexeya hatina nava welêt, dîsan daxwaza penahxwaziyê bikin.

## Piştî rêbaza penahxwaziyê

Piştî AA yan AA+, hûn dê biçin navendeke din ya COA ya wergirtinê.

**Daxwaza we qebû bûye**
Eger IND daxwaza we ya penahxwaziyê qebûl bike, hûn dikaarin bi awayê demkî yan herdemî li Holandayê bimînin. Hûn dê destûra mayînê wergirin, dikarin kar bikin, û her endamê malbatê bînin. COA bo peydakirina malê arîkariyê bide we. Zanyariyên girîng bo mala we dê li civîneke bi COA re bi belge bibin. Hûn dê ser bingeha zanyariyan serdana şaredariyekê li Holandayê bikin. Ew şaredarî dê li maleke guncaw bo we bigere. Tenê dê malekê bidin we û hîn divê wê qebûl bikin. Heya ku mala we bixwe hebe, hûn dikarin li navenda COA ya wergirtinê bimînin. IND dê we ji maf û erkên we piştî dayîna daxwaza penahxwaziyê agahdar bike. Karmendên VWN dikarin arîkariyawe bikin bikevin nava civaka Holandayê. Ev dê arîkar be bi saziyên cur bi cur re pêwendiya we hebe, û dikare li çûyîna bo şaredariyê û peydakirina dibistanê yan kar arîkar be. VWN dikare arîkar be endamên malbataxwe jî bibin.

**Daxwaza we red bûye**
Eger IND daxwaza we ya penahxwaziyê red bike, hûn dikarin li dadgeheke Holandayê û bi şêwirmendiya parêzerê xwe itiraz bikin. Ev yanê hûn bi fermî dadgehê agahdar

dikin hûn dijî biryara IND ne. Hûn bi gelemperî li wexta pêvajoya itirazê li Holandayê dimînin. Eger destûra vê nedin, hûn dikarin ji dadgehê destûrê bixwazin li wexta rêbaza itirazê li Holandayê bimînin. Parêzerê we dê bo vê arîkariyê bide we. Dadgeh dê lê binêre ka IND di biryara daxwaza we ya penahxwaziyê de qanûna Holandayê rast bi kar aniye yan na.

Eger IND daxwaza we ya penahxwaziyê red bike, dê we bibin navendeke cuda ya penahxwazan. Bi gelemperî dê 28 rojan wext bidin hûn ji Holandayê derkevin. Piştî wê serdemê, hûn êdî nikarin parastî bin, û êdî nikarin li navendeke penahxwazan bimînin. Hûn dîsan jî dikarin bo arîkarî û zanyariyên piştî rêbaza penahxwaziyê bi VWN re pêwendiyê çêbikin.

**Vegerîn**
Bi fermî, hûn bixwe berpirsê vegerîna bo welatê xwe ne. Lê, Dienst Terugkeer en Vertrek (DT&V) dê arîkariyê bide we bo vegerîna bo welatê xwe amade bibin. DT&V piştî redbûna daxwaza we ya penahxwaziyê bi we re pêwendiyê çêbike. Eger hûn bixwe di nava serdema diyarbûyî de neterikînin, hûn dê werin paşvegerandin.

Eger hûn hez dikin ser zû vegerîna xwe bi DT&V re biaxivin, parêzerê we yan karmendê VWN dikarin pêwendiya we bi wan re çêbikin. Hûn dikarin bixwe jî bi forma taybet ser malpera DT&V pêwendiyê çêbikin.
- Holandî: https://www.dienstterugkeerenvertrek.nl/ondersteuning-bij-terugkeer/hulp-van-dtv
- Inglîsî: https://english.dienstterugkeerenvertrek.nl/return-assistance/documents/leaflets/2016/12/22/if-you-no-longer-want-to-stay-in-the-netherlands

Eger hûn hez dikin bi dilê xwe vegerin welatê xwe, hûn dikarin bi Internationale Organisatie voor Migratie (IOM) re pêwendiyê çêbikin. IOM dikare zanyariyên pratîk dabîn û bo çûyîna we arîkariyê bike. IOm bi gelemperî xwedana navendeke şêwirmendiyê li navenda penahxwazan e.

## Nirxandina daneyên ferdî

Daneyên ferdî her cure zanyariyên ser we ne. Saziyên ku ser vê nivîsokê hevkarî kirin ev in. Ew daneyên ferdî dinirxînin hevdem jî li daxwaza we ya penahxwaziyê dinêrin, ser agahdarî yan daxwazê. Ew dê ser hûrgiliyan ji we bipirsin û eger li gor qanûnê pêwîst be ji saziyên din jî. Ev sazî daneyên we bi kar tînin û zexîre dikin û eger li gor qanûnê pêwîst be bi saziyên din re bi par ve dikin. Qanûna veşartîmayînê bo saziyên ku daneyan dinirxînin erka wan diyar dike. Wek mînak, divê ew daneyên we bi baldarî û veşartî lê binêrin. Qanûna veşartîmayînê mafên we jî diyar dike, wekî:
- mafê destgihîştina daneyên xwe yên saziyan zexîre kirine;
- mafê ku bizanin kîjan sazî ser daneyên we kar dikin û çima;
- mafê ku bizanin kîjan saziyan daneyên we bi par ve kirine.

Bo zanîna agahiyên pirtir ser çawan nirxandina daneyên xwe yên ferdî, serdana malpera saziya têkildar bikin.

## Daxwaza penahxwaziyê li binçavgeha biyaniyan

Kesên ku nikarin li Holandayê bimînin û bi dilê xwe welêt neterikînin dikarin bikevin binçavgeha biyaniyan. Binçavgeha biyaniyan yanê li cihekî ewle de bimînin (navenda binçavkirinê) Mebesta wê xwedîkirina wan kesan e ku nikarin li Holandayê bimînin û dê werin paşvegerandin

Eger hûn li binçavgeha biyaniyan in û daxwaza penahxwaziyê didin, yan eger we daxwaza penahxwaziyê daye û piştre ketin binçavgehê, daxwaza we ya penahxwaziyê dê li Justitieel Complex Schiphol (JCS) were nirxandin. IND divê di nava şeş hefteyan de ser daxwaza we biryar bide.

Bi gelemperî dê we bibin avahiya JCS, lê mimkin e jî hûn cihê niha lê ne bimînin. Eger hûn biçin CS û bo cara yekem daxwaza penahxwaziyê bidin, karmendekî IND dema gihîştinê formeke kaxizî yan dîjîtal tijî bike. Jê re dibêjin forma daxwazê.

Wê demê hevpeyvîneke destpêkê bi navê hevpeyvîna daxwazê tê kirin. Hevpeyvîna daxwazê civîneke girîng e, tê de IND pirsan dike. Armanca vê hevpeyvînê wergirtina zanyariyan ser vê ye hûn kî ne û ji ku tên, sefera we û sebeba hatina we bo Holandayê. Dê ser van ji we bipirsin:
- pênaseya we, netewe, cih û welatê jê tên;
- malbat;
- belge;
- perwerde;
- kar û xizmeta leşkerî;
- mayîna li welatên din;
- sefera we bo Holandayê;
- şiroveyeke kurt ser sebeba bo penahxwaziyê.

Rast bibêjin û hertim hûrgiliyan bidin. Ji belgeyên neraast daneyan bi kar neyînin. Eger we nasnavê xwe bi kar anîbe, IND agahdar bikin. Dayîna zanyariyên nerast yan netêkûz bo IND dikare ser biryara daxwaza penahxwaziya we bandorê neyînî dayîne.

IND dê ji hevpeyvînê raporê amade bike. Parêzer dê kopiyeke raporê bide we. Parêzerek dê diyar bibe bo amadekirina rêbaza penahxwaziyê arîkar be. Parêzer qanûn û rêzikên ser penahxwaziyê dizane û ji girîngiya hevpeyvîna bi hûrgilî agahdar e. Hevpeyvîna bi hûrgilî civîneke bi IND re ye ku tê de hûn dibêjin çima daxwaza penahxwaziyê dikin. Hûn divê dirav nedin parêzerî; Raad voor Rechtsbijstand bo we vêya dike. Hûn dikarin ji parêzerî daxwaz bikin wexta rêbaza penahxwaziyê li qonaxa destpêkê de jî arîkar be. Lê, hûn divê bixwe tivdîrê bikin û xercê xwe bidin.

Rêbaza Giştî ya Peahxwaziyê (AA yan AA+) li binçavgehên biyanî de bo penahxwazên li binçavgehên biyaniyan de nînin wekhev in. Destpêka vê nivîsokê rêbaza AA yan AA+ roj bi roj şirove dike.

**Rêbaza sadekirî ya penahxwaziyê**
Eger hûn ji welatekî ewle bin, ihtimala dayîna penahxwaziyê bo we kêm e. IND dê daxwaza we bi rêbazeke sadekirî û zû binirxîne. Di wexta vê rêbazê de, tenê hûn dê hevpeyvînekê bi IND re bikin. Ev wê demê jî bi kar tê ku destûra we ya mayîna penahxwaziyê li Holandayê, welatekî din yê Yekîtiya Ewropayê, Norvej, Îsland, Lîxtênştayn yan Swîsê hebe. IND dê sebebên daxwaza we ya penahxwaziyê binirxîne ka biryar bide destûra penahxwaziyê bidin we yan na.

*Lîsteya welatên ewle*
Albanya, Cezayir, Andora, Avûstrlya, Beljîk, Bosnî-Hêrzêgovîn, Brêzîl, Bulxaristan, Kanada, Qibris, Danmark, Estonî, Fenland, Frans, Almanya, Gurcistan, Gana, Yûnanistan, Mecaristan, Îrland, Hindistan, Îtaliya, Camaîka, Japon, Kosovo, Krwatiya, Latviya, Lîxtênştayn, Lîtwanî, Lûkzambûrg, Malt, Merakiş, Monako, Moxulistan, Montenegro, Holanda, Niyûzîland, Makedonyaya Bakûr, Norwêj, Ukrayn, Avûstrya, Lehistan, Portegal, Romanya, San Marîno, Sênêgal, Sêrbistan, Slovênî, Slovakî, Spanya, Trênêdad û Tobago, Komara Çêkê, Tûnis, Baarê Vaatîkanê, Paşatiya Yekbûyî, îsland, Swêd û Swîs.

Evlîstedikare biguhere; hin welat dikarin lê zêde bibin yan kêm bibin. Ev anegorî ewlehiya li welatan e. Nusxeya dawîn a lîsteya welatên ewle dikarin ser malpera dewleta Holandayê peyda bikin: www.rijksoverheid.nl

**Piştî rêbaza penahxwaziyê**
Eger IND daxwaza we ya penahxwaziyê red bike, hûn dikarin li dadgeheke Holandayê û bi şêwirmendiya parêzerê xwe itiraz bikin. Ev yanê hûn bi fermî dadgehê agahdar dikin hûn dijî biryara IND ne.
Hûn dikarin ji dadgehê destûrê bixwazin li wexta rêbaza itirazê li Holandayê bimînin. Parêzerê we dê bo vê arîkariyê bide we.

Dadgeh dê lê binêre ka IND di biryara daxwaza we ya penahxwaziyê de qanûna Holandayê rast bi kar aniye yan na. Di gelek mijaran de, dê bihêlin hûn li benda biryara dadgehê li Holandayê bimînin. Lê, hûn neçar in li cihê ewle de bimînin.

**Vegerîn**
Eger destûr tuneye hûn li Holandayê bimînin, hûn bixwe berpirsê terikandina welêt in. Lê, Dienst Terugkeer en Vertrek (DT&V) dê bo arîkariya çûyîna we bi we re pêwendiyê çêbike. DT&V wexta ku daxwaza we ya penahxwaziyê red bû dê tenê carekê vêya bike. Eger hûnz hez dikin bi DT&V re ser zû vegerîna xwe biaxivin, parêzerê we dikare pêwendiya we bi wan re çêbike. Hûn dikarin bixwe jî bi forma taybet ser malpera DT&V pêwendiyê çêbikin.

- Holandî: https://www.dienstterugkeerenvertrek.nl/ondersteuning-bij-terugkeer/hulp-van-dtv
- Inglîsî: https://english.dienstterugkeerenvertrek.nl/return-assistance/documents/leaflets/2016/12/22/if-you-no-longer-want-to-stay-in-the-netherlands

Eger hûn hez dikin bi dilê xwe vegerin welatê xwe, hûn dikarin bi Internationale Organisatie voor Migratie (IOM) re pêwendiyê çêbikin. IOM dikare zanyariyên pratîk dabîn û bo çûyîna we arîkariyê bike. IOm bi gelemperî xwedana navendeke şêwirmendiyê li binçavgehê ye.

## Pirsên zêde tên kirin

**Rêbaza Giştî ya Penahxwaziyê kingê dest pê dike?**
Yekemîn hevpeyvîna we bi IND re dê piştî tomarbûna li bal polîs wekî penahxwaz pêk were. Ji vê re dibêjin hevpeyvîna daxwazê. Piştî hevpeyvîna daxwazê herî kêm 6 rojan wexta we heye bo rêbaza penahxwaziyê amade bibin (AA yan AA+). Di pratîkê de,

heya rêbaza penahxwaziyê dest pê bike pirtir dikişîne. Di hin mijaran de, renge wexta amadebûnê nedin we. Li navenda COA ya wergirtinê, hûn dê nameyeke vexwendina bo hevpeyvîna bi hûrgilî wergirin.

**Çiqasî divê li benda biryara IND bimînim?**
Rêbaza Giştî ya Penahxwaziyê bi gelemperî 6 (AA) yan 9 (AA+) rojên karî dikişîne. Carinan renge IND nikaribe di wê wextê de biryar bide, wek mînak, eger hûn li wexta rêbaza penahxwaziyê nexweş bikevin. Eger wisan be, IND dikare AA yan AA+ heya 6 rojên karî yan pirtir dirêj bike. Nivîsgehên IND bi gelemperî şemî û yekşemiyan girtî ne: ev wekî rojên karî nayên hesab. IND renge biryar bide daxwaza weya penahxwaziyê bi rêya Rêbaza Giştî ya Penahxwaziyê binirxîne. Eger wisan be, ew dikare ji roja imzekirina daxwaza penahxwaziyê heya biryardana IND 6 mehan bikişîne. Hûn dê nivîsokeke din bi zanyariyên ser Rêbaza Dirêj ya Penahxwaziyê wergirin.

Eger IND nikaribe di nava 6 mehan de biryar bide, hûn dê agahdar bibin. Eger IND 6 mehan piştî imzekirina daxwaza penahxwaziyê biryarek ji we re neşand û we ser mijarê ji IND peyamek wernegirt, hûn dikarin nameyekê ji IND re bişînin û daxwaza biryara zû ser daxwaza xwe ya penahxwaziyê bikin.
Parêzerê we dikare bo vêya arîkar be.

**Ez tercîh didim çîroka penahxwaziya xwe ji jinekê re bibêjim. Ev mimkin e?**
Erê, hûn dikarin li wexta hevpeyvîna daxwazê (wek mînak, hevpeyvîneke bi IND re) vêya diyar bikin. IND dê hewl bide karmendek û wergêreke devkî ya jin bo hevpeyvîna bi hûrgilî amade bike. Eger hûn tercîh didin çîroka xwe ji mêrekî re bibêjin, hûn dikarin li wexta hevpeyvîna daxwazê vêya diyar bikin. Eger wisan be, IND dê hewl bide karmendek û wergêrekî devkî yê mêr bo hevpeyvîna bi hûrgilî amade bike.

**Eger nexweş yan ducanî bim divê çi bikim?**
Eger hûn nexweş yan ducanî bin, li wexta lênêrînê bo tewsiyeyên bijîşkiyê ji perestarê re bibêjin (li nivîsokê binêrin: Beriya rêbaza penahxwaziyê). Ev bi taybet girîng e eger nexweşiyeke we ya jêgir heye yan fikir dikin heye wekî sîl, postxurîn yan hêpatîta B. Her tişta hûn ji perestarê re bibêjin dê veşartî bimîne. Perestar dê tu caran zanyariyên ser tenduristiya we bêyî destûra we bi kesên din re bi par ve neke. Eger hûn li wexta rêbaza penahxwaziyê nexweş bikevin, ji karmendê COA, IND yan VWN re bibêjin. Ew dikarin arîkar bin arîkariya bijîşkî ya pêwîst wergirin. Eger hûn li roja civîna bi IND yan parêzerê xwe re nexweş bin, ji endamekî COA daxwaz bikin IND yan parêzerê we agahdar bike.

**Pirs**
Eger piştî xwendina nivîsokê pirsên we hebin, ji kerema xwe bi parêzerê xwe yan karmendê COA, IND yan VWN re biaxivin.

**Gilî û gazinde**
Hemû saziyên têkildarî rêbaza penahxwaziyê pispor û baldar in. Lê, eger hûn hîs dikin saziyê bi we re baş reftar nekiriye, dikarin dozê vekin. Parêzer wê yan karmendê VWN dikare bo vêya arîkar be.

Ev nivîsok weşaneke hevbeş e ji:
Afdeling Vreemdelingenpolitie, Identificatie en Mensenhandel (AVIM)
Centraal Orgaan opvang asielzoekers (COA)
Immigratie- en Naturalisatiedienst (IND)
Koninklijke Marechaussee (KMar)
Raad voor Rechtsbijstand (RvR)
VluchtelingenWerk Nederland (VWN)
Internationale Organisatie voor Migratie (IOM)
Dienst Terugkeer en Vertrek (DT&V)

Bi beşdariya:
Ministerie van Justitie en Veiligheid, directie Migratiebeleid
www.rijksoverheid.nl

Ji naveroka vê weşanê tu maf nayê derxistin. Eger navbera nusxeya sereke û wergerê de cudahiya şiroveyê derkeve, nusxeya Holandî bi itibar e.